

Ji Yekitiye Re Silav

Tekoşîn, ji bo mafên civakî

Em hinî tiştên ku li ber çavên me diqewimin, û wekî tiştên asayî tîr ragihandin nabin: Rewş nabe baştirîn. Êş û mirin ji îstisnatiye derketin. Hê jî em dest didine jiyana mirovên ku ne ji vir in û yê ku dixwazin werine vir. Dijûn li mirovan dikan, tif dikine ruyên wan û lêdanê li wan dikan. Pevgirtina bi sedhezaran mirovan rastî muameleyeke nebaş hat û demxe xwar. Ji bo astenkirina derbasbûna me dîwaran ava dikan. Dixwazin me derveyî sînora bikin û me ji çavan dûr bixin. Lê belê em li vir in. Em êş li vir bin. Hêviyên me hene. Em dijîn. Ji yekitiyê re bejin silav!

Bîranînên me ji hemû demî tazetir in.

Em jê naqerin. Em havîna 2015an bînin bîra xwe. Bi sedhezaran mirov sînorên Ewropa derbas kirin. Tu kes nikarî bû wan rabiwestîne, çimkî li hemberî rawestîna bûn. Bes dest bi meşê kirin. Ji bo bigihîjine armana xwe ketine livînê. Ji stasyona trêne ya Budapeştê heya sînora Awustriya meşyan. Tevger, gihîşte azadiya xwe. Ji bo mafên xwe, ji bo mafên hebûna xwe, ji bo parastin, alîkarî û pêşeroja xwe. Ev "Meşa Hêviyê" ya ku ji bo mafê koçberiyê ye di nav dirokê de buyerekî ku teqez nayê jibîrkin e.

Îro em hin jî gelek însan in. Em hê li vir in û hejmara me zêde dibe. Feraseta me yî têkoşînê ya li hemberî vê rewşê didome. Protestoyên biçûk û mezin bûne perçeyek ji jiyana me. Hêviyên sala 2015an ji holê ranebuye. Ev hêvî li Almanya û Ewropa pêşengtî ji çalekiyên piştgiriya re kir. Em ê ji bo penaber, koçber û hebûna xwe têkoşîna xwe bidomînin. Piştgiriya me roj bi roj didome. Li hemberî zordarî û polîtîkaya avêtina derveyî sînora dewletan em çalekiyên xwe didomînin. Em li hemberî teşeyên rastgiriya nû û faşîzma kevna radiwestin. Em li vir in û em ê li cem penaberan bin. Em jî yê ku hatine vir in. Ji pevratiyê re silav!

Ji Piştgiriya Heya Siyasetê!

Polîtîkayên koçberiyê yê aniha divê careke din bê nixandî-êv nabe mijara nixandî. Ev fikir di navenda xebatên me yî politik de ye û wê wisa jî bimîne. Yê li jêr hatiye nivîsandî ji bo hemû siyasetmedaran e:

- Ji bo mafe hatin û veqetîna: Mirinan bisekinîne! Pêwîste mirinên di Deryaspi de bên sekinandin. Niha, bi lezgînî. Ev ne mijara dahurandin û nîqaşê ye. Em asayî dîtina êş û mirinên ku di nav vê sînora kûjer de pêk tîr dikan. Yê ku dixeniqin, di esasê xwe de tîr kuştin! Ger ku mirov li balefir û keştiyên ku tîr Ewropa bêne suwarkirin, wê mirina bi hezaran mirovan sibê rabiweste. Lê belê ev zalim li yê ku alîkari dikan re jî tehde dikan. Daxwaza me ew e ku bila polîtîkayên Ewropî yê koçberiyê buguhere! Ji bo rêyên ewle, ji bo azadiya rêwîtiyê û ji bo Ewropayê mevanperwer!

- Ji bo mafên îqameyê: Netirsin! - Di nav çend salên borî de bi sedhezaran mirov xwe gihandine Elmanya. Lê bi sedhezaran însan jî hin nizanin ku karin li Elmanya bimînin. Bêyî ku mafên mayîne bisitînin, berî ku dest bi jiyana xwe bikin û ji xwe re jiyana nû ava bikin bi tîr, nediyarî û bêwlehiyê re rû bi rû dimînin. Ev di heman demê de tîr wateya pêwîstiya jinên ku bi cûdakirin û tundiyê re rû bi rû dimînin edî nemînin û malbatên ku ji hev qut buyî bigihîjine hevdu ye. Bangewaziya me li hemû kesên ku vê qerara siyasî daye heye: Bêmerc mafên

Îqameyê û rawestandina paşve vegerandinan -bi lezgînî! Yên ku li vir in ji vir in û dê li vir bimînin!

- Ji bo Mafê Piştgiriye: Deng Derxin! Qanûn, cûdahiyê dixê navbera jêderkên cûda yê welatinan û li gorî vê me bi cih dike: Di derheqê îqameyê de yê ku dibêjin baş e û yê ku dibêjin ne baş e. Welat ewle, neewle û niv ewle hatine bi navkirin. Ji ber vê cûdakirinê yê ku herî Zêde eş dikişînin kêmjimarên wekî Romanan û yê ku ne li gorî "asta" civakê ne li benda erêkirina xwe ne. Ne girêdayî neteweyekî, em daxwaza mezinkirina têkoşîna xwe dikin.

- Ji bo Mafên Wekhevî: Nijadperestiyê rabiwestînin! Bes ne du mehên dawî, ev bi sedsalan in civaka me pirengî bû. Îro çend kes li axa bavikên xwe dijî? Mirov hîn jî ji welatên din tên. Ji welatên xwe qut dibin. Tu sedem ji mafên newekhev re nîn e. Bila Sûrî, Yewnanîstan, Makedonya, Nijerya, Mexrîb bibe an jî Baden-Württemberg bibe. Bila ji bo mafên xênî, perwerde, xebat, gerîn an jî tenduristiyê. Mafên polîtîk û civakî ji bo her kesî derbasdar e. Ji bilî îstisnayekê û ji serî ve!

- Ji bo Mafa Bicîhbuyîne: Em ji neheqiyên kûrewî re bêjin na! Bi sedsalan hin welat çavkaniyên hin welatan dizî. Bazirganiya xulaman û çavkaniyên sirûştî. Dewlemendiya Dewletên rojavayî ji nijadperestiyê û metîngeriyê ava buye. Ewropa, kapîtalîzma ku her roj dibe sedema mirina însanan pêşkeş dike. Mirovên ku tiştek di destê wan de nemane û dixwazin li jiyane bimînin direvine Ewropa. Em ji bo hemû kesî mafên wekhevî dixwazin. Pêwistiya hemû însanan a jiyane, dilşadiyê û bi paşerojê xweş heye. Bes ne li Ewropa, li hemû deverên cîhanê. Tu kes naxwaze ji welatê xwe bireve!

Dê dengê me balê bikişîne!

Berî hilbijartinên gelemperî bi hefteyekê em dixwazin ruyê xwe şanî we bidin. Em hemû li kolanên Berlîne bicivin. Em dixwazin yê ku heta niha dengê wan nehatiye heskirin û yê ku dengê wan hatiye astengkirin xwedî dengê bin. Ev çîrok îro di kampanyaya "ji bo adaleta civakî" de jî gelek caran nayê heskirin; mafê gelek ji wan ên hilbijartinê nîn e. Em dibêjin ku, ji yekîtiyê re silav!

Em dixwazin dema em derketine kolanên em bi girseyî bin. Divê yê ku berjewendiyên têkoşîne diparêzin tevî me bibin. Yê ku tehmûla wî/wê bi şert û mercên xerab re û bi mirina mirovan re tune ye, pêwiste werine meşa me. Em dizanin ku gelekî însan ji bo paşeroja xwe bi salan e şer dikin. Niha dema bi hev re deng derxistinê ye. Em ji texmînan zedetirîn in! Em ê bi hev re bin!

Ji ber vê sedemê, di dîroka Îlon 2, 2017an de li bajar û gundên xwe em bi mebesta salvegera "Meşa Hêviyê" we gazî civîn û çalekiyan dikin. Afirîner bibe!

Di 16ê Îlone de em li Berlîne bangewaziya çalekiyê netewî dikin. Werin û tevî meşa ku têkoşîna mafên civakî û piştgiriye dike bibin. Ji bi hevretiyê re silav! Em ê bibin yek!